Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1326 | 19-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# Hebûna jinê di aboriyê de girîng e

Solîn Mihemed/ Qamişlo

**Endama Komîteya Aboriya Kongra Star ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emel Ibrahîm diyar kir ku kar û xebatên wan ji demên berê baştir tên meşandin û wiha got: "Em niha amadekariyên xwe ji bo sala 2026'an jî dikin."**



Jin di hemû aliyên jiyanê xwe bi rêxistin kirine, bi taybet di herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de ev yek bi Şoreşa Rojava re birêxistin bû û jinan di hemû sazî, dezgeh, partî, tevger û komteyan di xwe rêxistin kirin. Kongra Star weke eniya yekemîn a hemû jinan e ku ji bo jin derveyî xebatên rêxistinî, proje û makanîzmeyên xebatê yên ku jin di civakê de xurt dike, ava dike. Li ser wê bingehê Komîteya Aboriya Kongra Star li hemû herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê hene, ev komîte bi awayekî rêxistinkirî ji bo pêşxistina aboriya jin proje û xebatan ava dike û pêş dixe. Ji wan çandinî, fabrîke, projeyên seweldariyê û hwd.. Di derbarê kar û xebatên xwe de endama Komîteya Aboriya Kongra Star ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê Emel Ibrahîm ji rojnameya me re axivî.

**'kar û xebatên me baş tên meşandin'**

Endama Komîteya Aboriya Kongra Star Emel Ebrahîm diyar kir ku heya niha kar û xebatên wan baş tên meşanidin û wiha got: Di sala 2025'an de li ser xebatên xweser, xebatên aboriya jin girîngî bi tayîbet li ser kopratîvan hat dayîn û di her cihî de civîn hatin lidarxistin ji bo kopratîvan, di civînan de jin hatin birêxistinkirin û aboriya civakî dan nasîn ji hemû jinan re. Bi vî rengî di sala 2025'an de piraniya pirojeyên me bûn bi rengekî kopratîv û herwiha di beşên me yên çandî û bazirganiyê de ne tenê berhemên çandiniya genim û ceh dikin, di heman demê de çandiniya daran, sebzeyan û hwd dikin. Ji xwe werşeyên dirûnê ku jin kar bikin da ku bixwe xwe birêve bibin bi rengekî kopratîv hatin vekirin.

**'Em niha amadekariyên 2026'an jî dikin'**

Emel Ibrahîm anî ziman ku di destpêka salê heya niha geveke baş hat avêtin û wiha berdewam kir: Ji bo beşê kopratîvê herwiha xebatên me yên din jî berdewam dike, bi tayîbet di beşê çandiniyê de û em niha amadekariyên 2026'an jî dikin. Di destpêka salê de hin astengî derketin ji ber ku jinan kêm berê xwe didan aboriya xweser ji ber ku ew sînorê ku dibêjin jin divê tenê di mal de be û zarokan xwedî bike, herçiqasî em dibêjin ku ew pisporiya xweser lingê xwe bigire û ji nava civakê rabe lê hîn lawazî di vî alî de heye. Heya niha jin cihê xwe di aboriyê de digire lê hîna pêwistiyên wê di pêşxistinê heye. Me girîngî bêtir da aboriya komînal û civakî da ku her kes tevlî aboriyê bibe. Da ku jin xwe birêve bibe hilgirtin çêbûn û semîner li ser aboriya komînal, xweser û civakî hatin dayîn, di simînerê de jî armanca me ya serke pêşxistina jin di milê aboriyê de bû.

**'Hin Pirojeyên me di dema pêş de hene'**

Emel da xuyakirin ku gelek pirojeyên wan di dema pêş de hene û wiha bidawî kir: Ji xwe pirojeyên me yên heyî berdewam dikin û pirojeyên me herdem bi pilansazî bi kar û xebatên wan re li gorî pêwistiyên ku tên dayîn. Me niha girîngî daye beşê perwerdeyê yên kopratîvan û çandiniyê hwd da ku bêtir pêşketin di warê aboriyê de çêbibe. Beşê lawaziyê hîna li cem me heye lê em hewil didin ku vê lawaziyê derbas bikin, niha jî em ekadimiyeke xwe hazir dikin ku tê de beşên perwerdeyên meslekî û fikrî bidin. Jinên ku cihên xwe di aboriya xweser de digrin ji çi alî ve pêdiviyên wan yên sereke bi kesên pispor hene da ku wan perwerde bikin û di milê aborî de wan bi pêş bixin.





Bi kamîreya Esmehan Gedro

## FERHENGA BIWÊJAN

**Halê me halê helawçiyan e:**
- Em di nava rewşeke pir nebaş de ne; karê me pir zehmet e.
**(Kesên helawê çêdikin hem pir diwestin, hem ji ber şîraniyê mêş didin wan)**
Ji kerê re gotin cehşikek ji te re **bû, got; serbarê min zêde bû:**
- Wê karê min zehmettir bibe; wê pirsgirêkên min pirtir bibin.
**Me gelek qiriktalî bi hev re dîtin:**
- Me bi hev re gelek êş û zehmetî kişandin.
**Pir êş kişand:**
- Ji bo kesê jiyana wî di tengiyê de borî tê gotin.
**Pir zehmetî kişand:**
- Bi heman wateyê.
**Por spî kir:**
- Pir zehmetî kişand; pir êş û nexweşî dîtin.
**Rê jê dernayê:**
- Çareseriya wê pir zehmet e.
**Roj lê çûye ava:**
- Rewşa wî pir xirab bûye; jiyana wî serûbin bûye.
**Te wisa kir em stêra bidûv (stêra bipoçik/stêra biqemçik) bibînin:**
- Te pir êş bi me da kirşandin; te pir zor û zehmetî bi me dan kişandin.
**Tu dibêjî qey rih li ber taveheyvê spî kiriye:**
- Ji bo kesê temenê wî di zehmetiyê de derbas bûyî tê gotin.
**Yekî digot mala min e, yê din digot warê min e**:
- Pirsgirêk çareser nabe; yek ji ya xwe nayê xwarê; her du jî serhişk in.

**LI SER WEFADARÎ, DURISTÎ Û DILPAKIYÊ**

**Çav ji çavan şerm dikin:**
- Divê mirov bi hev re rast be, ku mirov hev bixapîne, paşê mirovê çawa li çavên hev binêre.
**Deq û deq jê re got:**
- Bi awayekî eşkere jê re got; di **rûyê wî de jê re got:**
Deqerû jê re got:
- Bi heman wateyê.
**Dilêşê me ye:**
- Bi dil û can bi me re ye.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## 25'Mijdarê bangek ji bo şikandina bêdengiyê



Di 25'ê Mijdarê de, dengê jinan li çar aliyên cîhanê ji nû ve bilind dibe, li dijî tundûtûjî, cudakarî û qedexeyên ku li dijî jinan pêk tên, derdikevin. Ev rojek sembolîk e ku êşa jinan û hêviya wan ji bo guhertinê ber bi civakên dadperwer û demokratîk temsîl dike.**R-2**

## 'Serxistina pêvajoyê tenê bi axaftinan nabe divê dewlet gavan biavêje'



Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku li ser bingeha banga dîrokî ya Rêber Apo, ji aliyê PKK'ê ve gavên dîrokî hatin avêtin û got, "Serxistina pêvajoyê tenê bi axaftinan nabe, pêwîst e rayedarên dewleta Tirk bi awayekî lezgîn gavan biavêjin."**R-4**

## 'Me girtîgeh bi qada Mezlûm Doxan û Rêber Apo pênase dikir'



Têkoşerê Kurd Mistefa Seydo ku piştî 30 salan ji girtîgehê derket diyar kir ku dewleta Tirk her dixwest girtî xwe teslîm bikin û got, "Dewleta Tirk nedizanî ku di felsefeya me de teslîmiyet tune ye, me girtîgeh bi qada Mezlûm Doxan û Rêber Apo pênase dikir.'**R-6**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1326 | 19-Mijdar-2025 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S

# DORPÊÇKIRIN BINPÊKIRINA PEYMANA 1'Ê NÎSANÊ YE

Hevserokê Meclisa Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo diyar kir ku ji bo rakirina bihane û astengiyên li pêşiya pêkanîna bendên peymana 1`ê Nîsanê, herwiha rakirina ambargoya li ser her du taxan, wan bendên kontrolê rakirin û wê bendên hevbeş bên aktîvkirin. Şêxo tekez kir ku nêrîna wan ji peymanê re stratîjîke û ew ê rê nedin tu kesî ku jiyana gel bixe xeteriyê .**R-5**



## Nifir di çanda Kurdî de



Nifir taybetmendiyek û şêwazeke axaftinê ya civakê ye ku bi riya wê lav û diayên bi kîn tên kirin. Kurd jî ji bo bidestxistina mafê xwe nifiran li serdestan dike.**R-7**

## Rojnamevanên Ragihandina Azad piştgiriya xwe ji Rojava ta Bakurê Kurdistanê raber dikin



Di çarçoveya kiryarên dewleta Tirk li ser rojnamevanên Ragihandina Azad di Bakurê Kurdistan û Tirkiyê de, rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê siyaseta ku ji aliyê Tirkiyê ve tê meşandin, nirxandin û piştgiriya xwe ji bo rêhevalên rojnamevan raber kirin.**R-3**

**Kuştina jinan bê exlaqî ye**
Nehîr Pale R-2



**Qonaxa yekem; Aştî**
Farûk Sakik R-5

# 25’Mijdarê bangek ji bo şikandina bêdengiyê

Di 25’ê Mijdarê de, dengê jinan li çar aliyên cîhanê ji nû ve bilind dibe, li dijî tundûtûjî, cudakarî û qedexeyên ku li dijî jinan pêk tên, derdikevin. Ev rojek sembolîk e ku êşa jinan û hêviya wan ji bo guhertinê ber bi civakên dadperwer û demokratîk temsîl dike.

**Hêvî Keleş/ Qamişlo**

25’ê Mijdarê her sal wekî rojeke navneteweyî tê pîrozkirin da ku yek ji pirsgirêkên herî girîng ên cîhana me ya îro were destnîşankirin, şîdeta li dijî jinan. Ev roj ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve di sala 1999”an de hatiye damezrandin û xwişkên Mirabal ên Komara Domînîkî bi bîr tîne, ku di sala 1960”an de ji ber têkoşîna xwe ya li dijî dîktatoriyê bi hovane hatin kuştin. Ev dîrok bûye semboleke cîhanî ji bo têkoşîna li dijî her cûre şîdeta li dijî jin û keçan.

Ji 25’ê Mijdarê heta 10’ê Kanûnê, kampanyayek bi navê “16 Rojên Çalakvaniyê li dijî Şîdeta Li ser bingeha Zayendî” salane tê lidarxistin da ku balê bikişîne ser dijwariyên ku jin di parastina xwe ji şîdetê de pê re rû bi rû dimînin û hişmendiya mafên xwe yên parastinê zêde bike.

### Cureyên tundûtûjiyê û aliyên wê yên veşartî di civakan de

Tevî ku zêdetirî du dehsalan di ser naskirina fermî ya vê rojê re derbas bûne jî, jin li gelek welatan, bi taybetî li Rojhilata Navîn û herêmên şer, hîn jî bi gelek awayên tundûtûjiyê re rû bi rû dimînin ji aliyê, fizîkî, psîkolojîk, cinsî û aborî ve. Ev tundûtûjî ne tenê bi îstîsmara fizîkî an lêdanan ve sînordar e, ew heta bêparkirina wan ji perwerdehiyê, neçarkirina wan ji bo zewaca zû, astengkirina beşdarbûna wan di jiyana giştî de û bêparhiştina rola wan di biryardanê de dirêj dibe.

Di nav civaka Rojhilata navîn de ku hîn jî hêdî hêdî ber bi wekheviyê ve diçin, gelek jin di navbera adetên hişk û rastiyên aborî yên dijwar de asê mane. Çend keç ji ber nerînên teng ên civakî ji xewnên xwe yên perwerdehiyê bêpar mane? Çend jinan di bin navê “parastina rûmeta xwe” an îtaetê de rastî şîdeta navmalî hatine? Ev zîhniyet bêdengî, tirsê didomîne, şîdetê dike beşek normal a jiyana rojane ya jinan.

### Tundûtûjî li dijî jinan, diyardeyek civakî ye, ne takekesî ye

Tundûtûjiya li dijî jinan ne pirsgirêkek takekesî ye, lê diyardeyek civakî ya kûr e, nîşanek rasterast a çandeke cudakar e ku desthilata mutleq dide mêran û jinan wekî hebûnên bindest dibîne ku li ser beden an jiyana xwe tu kontrolek wan tune ye. Lêbelê, salên dawî hişyariya femînîst zêde bûye û dengê jinan ji her demê bêtir tê bihîstin. Li gelek welatan, tevgerên femînîst ên bihêz derketine holê, ku daxwaza qanûnên ji bo astengkirina tundûtûjiyê, parastina jinan ji tacîz û tecawizê û misogerkirina mafê wan ê wekheviya tevahî di kar, perwerde û mîratê de dikin. Li Kurdistan, Sûriye, Iraq û welatên din ên herêmê, tevgerên jinan ên berbiçav derketine holê, ku tevî çavkaniyên sînorkirî û şert û mercên dijwar, ji bo hişyarkirina kesên ku ji tundûtûjiyê rizgar bûne dixebitin û piştgiriya psîkolojîk û qanûnî peyda dikin. Rêxistinên civaka sivîl di vê têkoşînê de roleke girîng dilîzin, ew binpêkirinan belge dikin, ji bo jinên rastî îstîsmarê hatine parezgehên ewle peyda dikin û ji bo guhertinên qanûnan ku şîdetê rewa dikin an jî cezayên ji bo sûcdaran sivik dikin, parêzvaniyê dikin. Ev rêxistin her wiha hewl didin ku mêran di rûbirûbûna vê diyardeyê de beşdar bikin, ji ber ku têkoşîna li dijî şîdeta li dijî jinan ne tenê berpirsiyariya jinan e, lê berpirsiyariyeke kolektîf e ku wijdanê tevahiya civakê eleqedar dike.

### Perwerde bingeha guhertina civakê ye


Aliyên çandî û perwerdehî yên vê pirsgirêkê nayên paşguhkirin. Perwerdehiya ji bo wekheviyê li malê û li dibistanê dest pê dike, ku zarok ji temenê biçûk ve fêr dibin ka çawa bi keç û jinan re têkilî bikin û çawa rûmetê bidin wan. Avakirina hişmendiyek nû ku tundûtûjiyê red dike û baweriya xwe bi hevkariya rastîn di navbera zayendan de tîne, rêya herî girîng a ber bi guhertinek domdar ve ye.

Jina ku her tim sembola comerdî û sebirê bûne, heq dikin ku bi rûmet û rêzdarî werin muamelekirin. Hêzdarkirina wan ne tê wateya pêşbaziya bi mêran re, lê belê avakirina civakek hevseng li ser bingeha edalet û wekheviyê ye. Dema ku jin ewle bin, tevahiya civakê ewle ye û dema ku rûmeta wan tê rêzgirtin, nirxên mirovan geş dibin.

### Bangek ji bo şikandina bêdengiyê û avakirina pêşerojê

Roja Navneteweyî ya ji bo Jiholêrakirina tundiya li ser Jinan ji bo rêxistin û kesan wekî bîranînek e ku bêdengî êdî nayê qebûlkirin û hemû şîdeta li ser jinan şîdeta li ser mirovahiyê ye. Ew bangek e ji bo guhertinê, ji bo şikandina astengiya tirsê û ji bo sekinandina li kêleka jinên bêdeng. Ev roj ji bîranînek salane bêtir dimîne, ew pabendbûnek mirovî ya nûkirî ye ji bo piştgiriya jinan di têkoşîna wan a ji bo edalet û wekheviyê de. Jin ne tenê nîvê civakê ne, ew in ku jiyanê xwedî dikin, ava dikin û wate didinê.

Ji bo her jinekê ku li dijî êşê sekiniye û teslîmbûn red kiriye, ji bo her dayikekê ku hêsirên xwe veşart da ku zarokên wê wan nebînin, ji bo her keçekê ku tevî tirs û tariyê jî xewn dibîne. Nefikire ku dengê te qels e, ji ber ku dengê te destpêka guhertinê ye. Bibe hêza ku ronahiyê di dilê neheqiyê de diçîne û serê xwe bilind bike ji ber ku tu azad ji dayik bûyî. Mafê kesî tune ku te bêdeng bike an jî asteng bike. Her tim ji bîr neke ku rûmeta te mafek e û azadiya te ne qenciyek ji kesekî ye, lê belê bingeha hebûna te ye. Ji ber vê yekê, ne tenê ji bo xwe, lê ji bo her jinekê ku derfet nedîtiye bêje “bes e”, têkoşînê bidomînin.



**Ji Pênûsa Jin**

### Kuştina jinan bê exlaqî ye

**Nehîr Pale**

Civaka me gelekî girîngî dide exlaq! Dibe ku gotina herî zêde dayîk û bav ji zarokên xwe re dibêjin, mamoste ji şagirtan re tînin ziman û ol li ser civakê ferz dike. Wexta dibêjin exlaq ew behsa çi dikin, ango ji çi re dibêjin exlaq? Gelo adet û rêzikên civakê exlaqên wê ne? Ji xwe hemû civak di navbera exlaq û terbiyekirine de tevlîhev dikin. Di civakê de kîjan ferd an jî malbat li gorî civaka xwe tevnegere yan jî tevgerkirina wan ne di çarçevê adet û rêzikên wan de bin, ji wan re dibêjin bê exlaq û bê terbiye ne.

Li gorî nêrîna min civak dema jinê dixe rewşa bi rêbazên qirêj were kuştin, ev yek bê exlaqî ye. Li bajarê Reqayê jina bi navê Fatma Hisên El-Şi,êb di mala xwe de hatiye kuştin. Fatma Hisên temenê wê 65 salî ye, bi tena xwe dijî û kesek li gel wê nîne. Berî du rojan hinek kes dikevin mala wê de û wê dikujin. Li gorî gotinên hatine belav kirin kesên wê kuştine dizin. Fatma ji ber zêrên wê hene, diz ketine mala wê de û ew kuştine. Ev rewşekî trajedî ye. Buyer çawa qewimî ye û sedemên wê çi ne hîna têne lêkolîn kirin. Lê bele dema ku jin di civakekê de bikeve vê rewşê de, bê exlaqî ye. Ew kesên Fatma kuştine zarokên vê civakê ne. Malbata wan heye û di nava vê civakê de mezin bûne. Ji wan re ne xeme ku jinekê bikujin û birev in. Ev buyer destnîşan dike ku çiqasî civak ji exlaq dûr ketiye. Niha li gel civakê jî ya girîng jinê desmal daye serê xwe yan na, cilên wê dirêjin an na, bi mêran re daxive yan na. Exlaq bi van tiştan pênase dikin û li ser jinê ferz dikin. Jina ku desmal nede serê xwe û li gorî adetên wan cilan li xwe neke ew bê exlaq e. Lê kuştina Fatma û hemû jinên têne kuştin bê exlaqî şîrove nakin û girîngî nadin wê. Mêran êrîşî Fatma kirine û ew di mala wê de kuştine, vê rewşê bi exlaq ve nadin girêdan û tenê cezakirina kesên Fatma kuştine li ser pirsgirêkê digrin.

Civaka zayendperest her tim jinê dixe rewşên mîna rewşa Fatma. Bê hurmetî li jinê dikin û dibêjin Fatma ji ber ku zêrên wê hebûn û bi tena xwe dijî êrîşî wê kirine û ew kuştin e. Her wiha buyerê bi çend kesên ku wê kuştine didin girêdan û dûrî xwe dinirxîn in. Fatma Hisên El-Şi,êb li taxekê ya bajarê Reqayê dijî, ango ne li çolê bû. Kesên ku êrîşî wê kirine dibe ku ji taxa wê bin û nêzî wê bin. Ji civaka wê êrîşî wê kirine û ew kuştin e.

Destdirêjkirina jinan û kuştina wan çavkaniya xwe ji zîhniyeta civaka zayendperest digre. Ne tenê kesên ku Fatma kuştine sûcdarin, giştî civak di ber vê buyerê de berpirsyar in. Êrîşkirina jineke 65 salî bê exlaqî ye û li beramberî hemû jinan bê rêzî ye.



# Nifir di çanda Kurdî de

Nifır taybetmendiyek û şêwazeke axaftinê ya civakê ye ku bi riya wê lav û diayên bi kîn tên kirin. Kurd jî ji bo bidestxistina mafê xwe nifıran li serdestan dike.


**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

**Nifir çi ne?**

Bê guman, di qonaxên kevnar ji qonaxên dîroka mirovahiyê de, seba tirsa mirovan ji nediyarî û nepeniyê, felsefeya ol û ayinan peyda bû. Bawermendiyên xwedawendan hatin terxankirin, da ku mirov pişta xwe bispêre hêviyê û xwe pê xurt û hêzdar bike. Ew in heyamên ku qencî û xirabî tê de hatine naskirin, agir û ronahiya rojê bûne sambolên evra û pîroz ji bo peresdariyê. Dêmek baweriya komê bi çi were, hem ji bo sûdgirtinê hem jî ji bo qenciyê ye. Dema ku mirovê ji komê, xwe lawaz û qels dibîne, ew bawerî jê re dibe hêvî û pişta xwe pê xurt dike. Lê berovajî vê jî, dema ku xwe di tengasiyê di dibîne. Ew bawerî jê re dibe çeka parastinê ku tola xwe pê ji aliyê ziyandar hilîne. Loma nifiran dike da ku berovajî qenciyê, ango xirabî bi serê kesê ziyandar were. Dibe ku her kes malovanî ji rewşa hin malbatên ku herdem têkçûn, nexweş, gunehkarî, xizanî û mirina gelek caran, tengasiyên encamdar dîtin û dan. Di piraniya van rewşan de, ev rawe nifir bi bav û kalan re derbas bûn. Ev hêz bi zanebûna demê, tunekirina mirov û nijada wî ferz dike. Armanca wê, wêrankirina tevahiya tevna malbatê ye. Bi vî awayî pêdivê ye, ku mirov baldar be. Sedema ku ji bo bicîhanîna nifirê be, mirov dikarin wek rêyaksiyon, perteka çavnebarî, çavbirçîtî û hezkirina nerênî xizmetê bikin.

**Nifir di çanda Kurdan de**

Di civaka Kurdan de, nifir cihekî taybet digire, di şer û pevçûnan de bi kar tê, bûye beşek ji qada zargotinan û bi taybetî jî, nifir hêmayeke bingehîn a zargotina kesên bindest e, weke ku dijûn jî hêmayeke kesên serdest e. Loma nirxandina nifiran, rewşa derûnî ya civakiya gelekî aşkere dike. Dema Kurd û carcaran jin dikevin tengasiyê, bê çareserî dimînin, berê xwe didin Xwedê, destê xwe vedikin û ji bo qencan û qenciyan duan dikin; ji bo xeraban û xerabiyan jî nifiran dikin. Nifir bi piranî berhemên çanda gelîrî yên olî ne. Bi “Gotinên nexweş” be jî qêrînekî li dijî neheqî û zilimkariyê ye. Tiştên ku mirov bi xwe nikarin bikin, ji destên wan nayên, hêvî dikin ku bi rêya hêzên sersiruştî, bi emrê Xwedê, bi daxwaza Pêxember, bi duayên şêxan heyfa wan ji yên musteheq were standin, dikin. Di civaka Kurdan de nifir xwedî cihekî taybet in di şer û pevçûnan de heya nifirek neyê ser ziman ew şer û pevçûn naqede an kêm dimîne. Dema ku mirov dikevin tengasiyê serî li nifiran didin. Bi vî awayî hinekî bêhna wan der tê. Aliyekî nifiran yê derûnî jî heye. Dema ku nifir rû bi rû werin kirin, carinan bandorê li kesê ku nifir lê têne kirin dikin. Kesê ku nifiran dike jî, ji ber ku hinekî dilê wê/wî rehet dibe, serî li êrişên fîzîkî nade. Hinek ji van nifiran piştgiriyê ji civatê distînin. Heta hin caran dema ku dê nifiran li zarokên xwe dike rû bi rû zarok jî hin bertekan li hemberî wê nîşan didin, ev bi xwe xaleke neyînî ye bandorê li giyana wan zarokan dike.



**Hin mînak:**

Nifir di rewşên hêrs û dilşewatiyê de tê bikaranîn nimûne rewşa jinên belengaz, kesên bêzar, bêpar, reben û perîşan.. bi rêya nifiran nas dibe.

-Xwedê te bibelqitîne û temenê te ji wê re be.

-Xwedê bistîne ji têran û bide me rebenan.

-Agir bi malê keto.

-Çavên te ronahî nedîto.

-Ocaxa mala bavê te vemire.

-Dê û bavê xêrik jê nedîto.

Di wan qonaxan de jî, hêvî û daxwaza qenciyê li dijî beramberi xirabiyê, weke çandeke pêwîst hate pejirandin.

Jiyanê berdewam kir, ta gihîşte qonaxên Yazdanî- xwedayî û ta nuha jî berdewam maye:

-Wey tu xêrê bikî, xêrê nebînî.. (ji gotinên dengbêjan).

-Xwedê mala te xirab bike.

-Derdê bê derman li canê te keto...

-Oxira wan ne ya xêrê be, çûna bê veger be.

-Wey xêrê ji ciwaniya xwe nebîne.

-Kul di mala te keto, hey malik li mîratê geriyawo.

Jêder: ji pirtûka nivîskar Arşek Baravî ya bi navê ‘Wêjeya Kurdî, Danehev û Nirxandin, Nêrîn û Belgeyên Gulîstana Wêjeyî’ û malpera KURDŞOP

# Bakur û Rojhilatê Sûriyê bûye navenda çand û hunerê

**Egîd jiyan**

Bakur û Rojhilatê Sûriyê ya ku hertim wek herêmek şer dihat nasikrin, êdî bûye navenda huner û çandê, mînaka wê li tu cihî nîne, gelên ku ji çandên cûda tên gel hev û hevpar di festîvalan de, di qada şanoyan de, di qada stranan de û di qada tevahî çand û hunerê de bûne yek, ji tevahîya cîhanê re bûne mînak. Ev dihêle ku di qada navnetewî de û di nav gelên cîhanê de hîn bêhitir deng bide, derkeve pêş, were nasikirin û bibe mînaka nemûneya çandên hevpar yên gel hev jîyan dikin. Ev jî dihêle fikir û felsefeya Rêber Apo bêhtir derkeve pêş û bandoriya xwe hîn xorttir bike di asta cihanê de.

Sûrîyeya ku navê wi hertim bi şer dihat naskir û herkes ji ditirsîya ku navê Sûrîyeyî bi kar anî ba û wek navenda şer, terorîzmê dihat naskirin û bîhîstin.

Çand û huner, ne tenê wek beşek ji jiyana me, lê wek bingeha hebûn û nasnameya civakekê tê dîtin. Ew ne tenê ji berhemên kevnar pêk tên, lê di heman demê de ew zimanê herî xurt in ku di navbera gelan û cîhanê de peywendiyê datînin. Huner dikanin tiştên ku ziman nikare bêje, nîşan bidin û çand ew qada hevpar e ku mirov tê de rastiya xwe dibîne.

**Vegera Çand û Zimanên Qedexekirî**

Di bin rejîmên berê yên Sûriyeyê de, ziman û çanda pêkhateyan, Kurd, Ereb, Suryan û Ermen, rastî qedexekirin û înkarkirinê hatibûn. Lê belê, piştî şoreşa 19’ê Tîrmehê (2012) gavên dîrokî hatin avêtin:

Perwerdeya Zimanê Dayikê: Yekemîn û gava herî girîng vekirina dibistan û akademiyan bû ku perwerdeya zimanê dayikê (Kurdî, Erebî, Suryanî) pêşkêş dikin. Ev yek tê wê wateyê ku nasnameya her pêkhateyekê bi awayekî fermî tê parastin.

Navendên Çand û Hunerê: Bi dehan navendên çandê, wek Navenda Çand û Hunerê ya Mihemed Şêxo (Qamişlo), hatin vekirin. Van navendan bûne cihê perwerdehî û pêşxistina jêhatîbûnên hunerî yên ciwanan di warên mûzîk, şano, şêwekarî û folklorê de.

Hunerên Gelêrî: Koma û komîteyên hunerî hewil didin ku muzîk û govendên resen, yên ku nêzîkî windabûnê bûn, ji nû ve zindî bikin û bi awayekî modern pêşkêş bikin.

Dika Hevpar: Şano, Sînema û Festîval

Tevgera hunerî li Rojava îro gelekî çalak e û bûye amûra sereke ji bo nîşandana rastiya herêmê û pêşxistina nirxên demokratîk.

Mîhrîcanên Şanoyê: Mîhrîcanên wek Şehîd Yekta Herekol ji bo komên şano yên herêmê û yên Kurdistanî bûne dika sereke dı mîhrîcanan de, lîstik bi Kurdî û Erebî tên pêşandan û pirsgirêkên civakî, jin, û şer tînin ziman.

Sînemaya Rojava: Pîşesaziya fîlman, tevî zehmetiyan, gelek fîlmên kurte û dirêj çêkirine. Ev fîlm çîroka berxwedanê, jiyana jinan û girîngiya Rêveberiya Xweser vedibêjin. Fîlmên wan li festîvalên navneteweyî jî beşdar dibin.

Mîhrîcanên Çandî: Festîvalên mezin ên ku hemû pêkhateyan li xwe digirin, têne lidarxistin. Ev mîhrîcan ne tenê pîrozbahî ne, lê wek platformek ji bo aştiyê û rêzgirtina ji pirrengiyê re xizmet dikin.

**Rola Hunerê di Dîplomasiyê de**

Çand û huner li Rojava ji xeynî rola wan a hundirîn, wek amûreke xurt di qada dîplomasiyê de jî têne bikaranîn. Dema ku navenda siyasî ya herêmê bi temamî nayê nasîn, berhemên wê yên çandî û hunerî bi hêsanî digihîjin cîhanê.

Veguhestina Rastiyê: Huner dibe zimanekî gerdûnî ku rastiya şer, berxwedan û jiyana rojane ya gelên Rojava ji raya giştî ya cîhanê re vedibêje.

Bûyîna Mînakekê: Pêşketina çandî ya li Rojava, ku gelên cihêreng di nav aştiyê de bi hev re afirîneriyê dikin, wek modela herî serkeftî ya jiyana demokratîk û laîk ji bo tevahiya Sûriyeyê tê nîşandan.

Bi kurtasî, Rojava di nav agirê şer de ne tenê hebûna xwe parast, lê di heman demê de bi navgîniya çand û hunerê, rûh û nasnameya nû ya herêmê ava kir. Ev tevgera hunerî û çandî, wek tevgereke azadiyê, hêvî û berxwedanê digihîne tevahiya cîhanê.

# ‘Me girtîgeh bi qada Mezlûm Doxan û Rêber Apo pênase dikir’

**Têkoşerê Kurd Mistefa Seydo ku piştî 30 salan ji girtîgehê derket diyar kir ku dewleta Tirk her dixwest girtî xwe teslîm bikin û got, “Dewleta Tirk nedizanî ku di felsefeya me de teslîmiyet tune ye, me girtîgeh bi qada Mezlûm Doxan û Rêber Apo pênase dikir.’**

**Viyan Egîd/Qamişlo**

Têkoşerê kurd Mustefa Seydo di sala 1975`an de li bajarê Efrînê ji dayik bûye. Di sala 1995’an de di encama îstxbaratê de ji aliyê dewleta Tirk ve hat girtin û cezayê heta hetayê lê hat birîn. Lê Mustefa û hevalên wî di nava 30 salî de destanek di hundirê hemû girtîgehên Tirkiyê de nivîsandin, bi berxwedanî, tekoşîn kirin û bi îradeyeke xurt çalakiyên li dijî dewleta Tirk pêk tanîn û bertekên xwe nîşan didan. Her wiha di nava 30 salî de ew di hundirê girtîgehê de parastina doza Kurd û Kurdistanê dikirin.
Di derbarê jiyan, berxwedanî û tekoşîna 30 salan di hundirê girtîgehê de, Mustefa Seydo ji Rojnameya me re axivî.

**‘Di sala 1993`an de ez tevlî Gerîlayên Azadiyê bûm’**

Mustefa Seydo diyar kir ku ew di 18`e saliya xwe de hat girtin û wiha got: “Di dawiya salên 70`î de Rêber Apo derbasî Rojavayê Kurdistanê bû, ji wê demê de Tevgera Azadiyê li Sûriyê xebitî, di heman demê de Akademiya Rêber Apo hat avakirin. Li vir jî tevger her diçû pêş diket, heta rêxistinkirina gel jî li pîş ket. Gelên Rojava êdî bi yek rihî kar û xebat didan meşandin, herwiha aliyê çand û hunerê ve jî xurt bû. Li ser vê esasî ku Tevgera Azadiyê bandoreke mezin li ser kesayeta me da avakirin, em gihîştine biryarekê ku tevlî refên Gerîla bibin. Di sala 1993`an de ez tevlî Gerîlayên Azadiyê bûm û raste rast ez derbasî Bakurê Kurdistanê bûm, ev jî xwesteka min bû. Ez bi ruhekî ciwan û kelecan bûm, ji ber ku em di nava desthiledariya dewletan de bûn, ew dewlet jî dixwestin me ji hemû aliyan ve bidin çewsandin û pişaftin. Tenê ji bo ku em jiyaneke azad û serbixwe jiyan bikin, min biryara tevlîbûnê da, ez bi vê biryarê serbilind bûm. Ji ber ku min didît ku çawa bi hezaran kes tevlî Tevgera Azadiyê dibin û ev hemî jî bandora fikir û felsefeya Rêber Apo ye, êdî em ji nû ve hişyar û jidayik bûn.”

**‘Di felsefeya me de teslîmiyet tune ye’**

Mustefa da zanîn ku di ancama istîxbaratê de ew ji aliyên dagirkeriya Tirk ve hatin girtin û wiha dewam kir: “Di Nîsana 1995`an de hevalekî me birînda bû, ji bo ku em wî hevalî tedawî bikin me berê xwe da gundekî ku li wir dektorek hebû, li gor agahiyên ku me girt, gotin: Ew doxtor welatparêz e û hûn dikarin biçin cem wî ji bo dermankirina hevalê birîndar. Lê mixabin dema ku em çûn cem doxtor, wî agahî da dewletê da ku werin me bigrin, di encama istîxbaratê de ez û 2 heval hatin girtin. Nêzî 25 rojan ez di lêpirsînê de mam, helbet me baş kiryar, siyaset û rûyê dagirkeriya Tirk nasdikir, ji ber vê yekê nikarî bûn me û îradeya me têk bibin. DewletaTirk her dixwest em xwe radestî wan bikin û teslîm bibin, lê wan nizanî ku di felsefeya me de tiştek bi navê teslîmiyet tune ye. Ji ber vê em bi hemû hêza xwe li dijî wan derdiketin û ji bo doza Kurd û Kurdistanê em ranewistiyan. Heya salên 2000’î tecrîd û îşkenceyekî pir giran li ser me didan meşandin, lê ev nebû sedem ku îrade û hêza me bişkînin, her ku dewleta Tirk zext û îşkenca li ser me zêde dikirin, ewqas çalakî û kîna me zêdetir dibû. Me rê ne dide ku ew serweriya xwe li ser me bidin meşandin. Ji bo ku dewlet nema êdî aleqedarî me bibe, me çalakiyên gireva biçîbûne, gireva mirinê û avêtina siloganan pêk tanîn. Li vir dema dewlet ew hêrsa me didît bi xwe sist dibû û zêde xwe nêzî me nedikir.
Piştî 25 rojên ji lêpirsînê, ez derbasî girtîgihan bûm, di girtîgan de hevalên me hebûn ku ji salên 80`î ve di girtîgehan de bûn, ji ber vê yekê dema ez derbasî cem wan bûm, min hîs kir ku ez derbasî akademiyekê bûme, bêguman hevalên me girtîgeh veguherandibûn akademî ku jiyana wan bi rêxistinkirî û her di nava perwerdê de bû. Li vir kêmek ez rehet bûm, ji ber min hevalên xwe li dora xwe dît û bi taybetî jî ku hîn xwe li ser fikir û felsefeya Rêber Apo kûr dikin. Çawa ku tekoşîna li derveyî girtîgihê tê kirin, tekoşîna di hundirê girtîgihan de jî heye, me dest ji xwe berneda, heya astekê bilind me tekoşîn û berxwedanî di hundirê girtîgihan de dan meşandin. Nayê bîra me ku me rojên xwe vala derbas kirin, her bi ruhê hevaltiyê xwe ji nû ve ava dikir, hete me xwe bi rexne û rexnedayinê jiyanekî rast ava kir.”

**‘Çi bibe û li kur be, pêwîst e jiyanekî bi rêxistinkirî em bijîn’**

Mustefa Seydo di berdewamiya axaftina xwe de behsa girtîgihên herî îşkence lê tê kirin kir û wiha anî ziman: “Bêguman hin girtîgehên ku di nava şert û mercên giran yên îşkencekirinê hebûn, di wan girtîgihan de morovahî hatibû tunekirin, ew girtîgeh jî ev bûn; girtîgeha Erzûm, El-Ezîzîyê û Elebistanê bû. Lê ya here zor û giran ku gelek hevalên me di bin îşkencê de hatin şehîdxistin, girtîgiha Erzrûmê bû, hevalekî me ji Agirî bû, ji ber îşkenceya giran xwe şehîd xist û gelek ji wan giran birîndar bûn. Dewleta Tirk kiryarên hov û dermirovî dikir, rehm di dilê wan de tune bû. Bêguman ev bûyrên îşkence û sehîdxistina hevalên me, bi awayekî veşartî dihat kirin û agahiyên derve jê tune bû ku girtiyên di girtîgihan de di bin îşkenceyê de dihiştin heya ku dighîştin asta şehadetê. Gelek kiryarên dewleta Tirk hene ku nehatine eşkerekirin, di heman demê de dewletên ku çavê xwe jê re bigirin jî hene. Herwiha heya 3`ê sal û nîv çûn û hatina me ya dadgihê çêdibû, di dadgehê de me parastina xwe ya şexsî nedikir, lê belê me parastina partiya xwe dikir û hemû kiryar û komkujiyên ku dewelta Tirk a dagirker li ser gelê kurd daye meşandin, me di dadgehan de tanî ziman. Piştre cezayê heta hetayê li ser min û hin hevalên min hat birîn, ev yek me dizanî bû, lê tenê siloganekî me hebû ku çi bibe û li ku be, pêwîst e jiyanekî rêxistinkirî em bijîn.”



**‘Me girtîgeh bi qada Mezlûm Doxan û Rêber Apo pênase dikir’**

Mustefa teqez kir wan hêza xwe ji heval, gel û Tvevgera Azadiyê digirtin û wiha doman: “Me qada girtîgehê bi qada Mezlûm Doxan dida pênasekirin, ji ber ku berxwedaniya heval Mezlûm Doxan, Kemal Pîr, Mihemed Xeyrî Durmûş û bi sedan hevalên me yên pêşeng îro me qada girtîgihê kiriye qada berxwedanî û tekoşînê. Bêguman di sala 1999`an de ku Rêber Apo rastî komployeke bêbex bû, ji ber vê yekê êdî girtîgeh ji bo me ne tenê bû cihê berxwedanê, lê belê bû mîna akademî, bû cihê xwendinê, zanebûn, berdozî, fikir û xweavakirinê. Jiyana girtîgehê ne hesan e, bi taybet ku bi salan dirêj bike. Gelek kes dibêjin we çawa 30 sal di hundirê girtîgihê de qedand, lê bersiva me her ew bû ku me hêza xwe ji heval, gel, Tevgera Azadiyê û Rêber Apo digirt, ew ji bo me dibûn hîz û îrade. Berx-



wedaniya wan îro gelek destkeftî bi dest xistin. Em ji gel, Tevgera Azadiyê û Rêber Apo bawer in, lewma em di wê baweriyê de bûn ku wê ev ked vala neçe.”

**‘Dewleta Tirk nikarîbû îradeya me bişkîne’**

Mûstefa Seydo di dawiya axaftina xwe de bal kişand ser çalakiyên wan yên di hundirê zindanan de û wiha pêde çû: “Dema ku tecrîd li ser Rêber Apo giran dibû, em hemû hevalên di girtîgihan de me dest bi çalakiyên cur bi cur dikirin, yek ji çalakiyên me ya herî ku bi ancam bû, gireva birçîbûnê bû. Dewletê nêzî 40 girtîgeh dan avakirin, da ku em di girtîgekê de nemînin û her car me bibin girtîgeheke nû, tenê ji bo agahiyê tu kesî ji me tune be, li vir dewlet hewil dide ku bi dekûdolaban agahiyên girtîgehan ji hevdû bide qutkirin, di heman demê de dewlet agahiyek belav dikir ku me hemû girtî belav kiriye û êdî nema dikarin tu tiştî bikin, tenê ji bo ew berxwedaniye di hundirê zindanan tê kirin vala derxîne. Lê dîsa jî û li gorî ewqas zextên li ser me dihat kirin, dema ku me çalakî dest pê dikirin, hemû hevalên di girtîgehan de di heman demê de bi hezaran daxwazname ji Wezîrê Edaletê re rê dikirn ku wan dest bi gireva biçîbûnê kirine. Li vir dewlet matmayî dima ku çawa agahiyên we ji hev çêdibe û di heman demê de daxwazname ji hemû girtîgehan de ji Wezîrê Edaletê hatiya şandin. Edî dewleta Tirk bi xwe ket wê baweriyê ku ew nikare hêz û îradeya me bişkîne. Wek tê zanîn ku piştî 30 salî biryara derketina min ji girtîgihê hat dayîn, bêguman dema ku min ewqas deskeftî dîtin û bi taybetî li Rojavayê Kurdistanê, rastî ew cihê kêfxweşî û şenaziyê ye ku îro me bi fikir û felsefeya Rêber Apo û bi peradîgma wî gelek destkeftî bidest xistin, fikir û felsefeya Rêber Apo bû çareseriya hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn.”



# Rojnamevanên Ragihandina Azad piştgiriya xwe ji Rojava ta Bakurê Kurdistanê raber dikin

**Di çarçoveya kiryarên dewleta Tirk li ser rojnamevanên Ragihandina Azad di Bakurê Kurdistan û Tirkiyê de, rojnamevanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê siyaseta ku ji aliyê Tirkiyê ve tê meşandin, nirxandin û piştgiriya xwe ji bo rêhevalên rojnamevan raber kirin.**

**Esma Mistefa/Qamişlo**

Di çarçoveya kiryarên li ser mafê rojnamevaniyê de, beriya demekê ji aliyê Hikumeta Tirkiyê ve biryara erêkirina cezayê girtinê yê nûçegihanên Ajansa Mezopotamyayê (MA) Dîren Yurserver, Selman Guzelyuz, Emrullah Acar, Zemo Aggoz, Midura Nûçeyan a JINNEWS’ê Oznûr Deger û rojnamevan Denîz Nazlim û Hakan Yalçin ji aliyê Dadgeha Hêrêmî ya Enqereyê ve hate derketin. Cezayê van hevalan hê jî didome.
Di heman demê de li ser rojnamevanên ku ji bo Rojnamevan Nazim Deştan û Cîhan Bîlgîn xebat li Bakurê Kurdistan dimeşandin û bi erkên xwe yên rojnamegeriyê radibûn ku her du heval jî bi SÎHA’yên dewleta Tirk dema geşedanên Bakur û Rojhilatê Sûriyê dişopandin, hatibûn hedefgirtin. Lê rojnameger Gulistan Dursun, Hayrî Tunç, xebatkarên Rojnameya Yenî Yaşamê Enes Sezgîn, Osman Akin, Can Papîla, edîtora ETHA’yê Pinar Gayip, nûçegihana Rojnameya Mucadele Bîrlîgiyê Serpîl Unal û siyasetmedar Hacî Ugîş û Îmam Şenol ku cînayet protesto kirin, bi îdiaya “propagandaya rêxistinê”, “tev li civîn û çalakiya derqanûnî bûn û tevî hişyariyê belav nebûn” û “muxalefeta li dijî qanûna civîn û çalakiyan” doz hatibû vekirin. Danişîna doza rojnameger û siyasetmedaran li 24’emîn Dadgeha Cezayên Giran a Edliyeya Stenbolê hate lidarxistin. û biryara beraetê hate dayîn.
Her çendî ev biryar hatibe dayîn jî, rûxmî ku li dijî mafê rojnamegeriyê û çapemeniyê ye, lê belê ev nayê wateya ku mafê rojnamevanan di Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de tê parastin bi sedan rojnamevanên Kurd, yên Çapemeniya Azad û yên ku li dijî dewletê derdikevin û firkrên xwe derdixênin pêş, ji aliyê hikumetê ve tên serdegirtin û cezakirin. Bi tu awayî parastina mafê rojnamevan û rojnamegeriyê di Tirkiyê de nayê kirin.
Têkildarî zihniyeta ku ji aliyê hikumeta AKP’ê ya ku li hember rojnamegeriyê, mafê rojnamevanan û bi taybet li hember rojnamevanên Kurd tê meşandin, her wiha piştgirya rojnamevanên



**Ekrem Bereket**

Bakur û Rojhilatê Sûriyê ji wan kesên ku rastî kiryarên hikumetê tên, Rojnamevan Ekrem Berekat û Sîlva Keleş ji Rojnameya me re axivîn.

**‘Dewleta Tirk dixwaze hemû dezhegên ragihandinê kontrol bike’**

Ekrem di destpêka axaftina xwe de zihniyeta dewleta Tirk li ser ragihandina azad anî ziman û wiha bilêv kir: “Dewlet bi hişmendiya xwe ya netewperest dixwaze hemû ragihandin û dezgehên rahigandinê yên ku berdefkiya civakê dikin, bixin bin kontrola xwe de û tenê xizmeta kapîtalîzmê bikin. Niha hevalên me yên ku di Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê de xebatê çapemeniyê didin meşandin, rastî van polîtîka û zihniyetan tên. Û em dikarin bêjin hema hemû hevalên me di bin cezayê de ne. Hinek ji wan girtîne, hinek ji wan ceza lê hatine birîn û dozên wan hene, hinek ji wan rojane tastî serdegirtin û tehdîdan tên. Hevalên me yên Rojnamevan yên ku li wir kar dikin, ji ber ku bale herî zêde dikşînin ser rastiya civak û çanda Kurdî, êş û azarên ku dikşînin, her wiha çalakî û xebatên ku li wir tên meşandin, bi van tewanan wan hevalan ceza dikin. Ev siyasetekî gelek qirêj e”.

**‘Di meşandina xebatên rojnamegeriya azad de bi îsrar in’**

Ekrem bal kişand ser girîngiya rol û xebatê çapemeniyê ya ku li Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê tê meşandin û wiha pê de çû: “Ger em bixwazin xebatê ku ji aliyê hevalên me yên Rojnamevan li wir bînin ziman, bi rastî xebatekî gelek girîng û hêja didin meşandin, rûxmî hemû destwerdan, zext û hewlidanên rêgirtinê lê belê di meşandina xebatê rojnamegeriya azad de bi îsrar in. Karê ku



**Sîlva Keleş**

didin meşandin ne tenê ji bo gelê Kurd tê kirin, di heman demê de ji bo civaka Tirkiyê jî xebat dikin. Em dibînin ku Tirkiye bi xwe d pêvajoyekî pir girîng re derbas dibe. Helbet yê ku berdefkiya vê pêvajoyê jî bike; Ragihandina Azad e. Ji ber wê niha dewleta Tirkiyê bi hemû hêza xwe hewildana girtina van hevalan dike û gelek heval jî ji wan hatine girtin û birtyarên cezayê derheqê wan de derxistine. Tu li dozên wan jî dinêrî, pir pasîf in, Nemaze, dibêjin çima tu bi pereyekî kêm kar dikî, çima tu çand û dengê vê civakê dide nîşandina herî zêde. Ê ev hemû hincetin û dixwazin bi wê yekê van hevalan tengav bikin.
Ji xwe kêla Ragihandina Azad a destpêkê li wir hatiye danîn, ji Şehîd Mazlûm Dogan yên ku kêla yekemîn a Ragihandina Azad daniye û li tevahî dunyayê belav bûye. Em hemû jî li ser wê mîrasê erkên xwe yên serdemê pêk tînin”.

**Yekbûna hêza Ragihandina Azad**

Ekrem di berdewamiya axaftina xwe de ev anî ziman: “Gelek hevalên me li Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi destê dewleta Tirkiyê hatin Şehîd xistin, êrişên li ser Ragihandina Azad û rojnamevanên wê li hundir û derve tê kirin. Ji ber naxwaze ku ragihandinek demokratîk û azad bê meşandin. Bi taybet di pêvajoya Rêveberiya xweser a Bakurê Kurdistanê de 2016’an de hatibû destpêkirin. Li vê derê piştgiriyekî pir mezin li seranserî xeta sînor hat raberkirin, me jî cih tê de girt. Di êrişên li ser Nisêbînê de ji aliyê Rojava de nêzî 85 rojnamevanên Ragihandina Azad di seranserî 74 rojan de 24 saetan rojev dişopandin. Her wiha dema girtina Rojnameya Azadiya Welat li Bakurê Kurdistanê ku di 4’ê Cotmeha 2016’an de hat girtin. Me li vir hejmara 5’ê Cotmeha 2016’an çap kir û li seranserî Rojava ji Dêrikê heyanî Navçeya Cindirêsê ya Efrînê belav bû û me derbasî aliyê Bakurê Kurdistanê jî kir. Me bi vê yekê ji wan re got kî, “hûn çiqas hewil bidin, hûn nikarin dengê Ragihandina Azad qut bikin”.

**‘Yên ku pêvajo famkirine; Xebatkarê çapemendiyê û rojnamevan in’**

Ekrem di dawiya axaftina xwe de “Ragihandina Azad ne hêza 4’emîn e, bûye a yekemîn. Di xeta Ragihandina Azad de kesên ku Şehîd ketine, tevahî ragihandinên cîhanê derbas dikin. Ji ber ku her kes dixwaze civakê bêdeng bike, vê yekê jî bi rêya ragihandinê dike. Ji bo hevalên me yên Rojnamevan yên Bakurê Kurdistan em bi hemû hêz û îradeye xwe bi wan re ne. Dibe ku hin caran di encama zextên heyî de em dighînin xeteke zirav, lê ev nayê wateya ku em tune dibin. Ragihandina Azad tune nabe, ji ber ji bingehekî saxlem û xurt ava bûye. Ragihandina Azad karîbû paradîgmeya Netewa Demokratîk bi civakê bida nasîn. Çima niha ev zext li Bakurê Kurdistanê tê meşandin, ji ber niha pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk hatiye destpêkirin. Kesên herî xurt û herî pispor yên ku ev pêvajo famkirine û dikarin bikin rojev; Xebatkarê çapemendiyê û rojnamevan in. Ji ber wisa dixwazin dengê wan teng bikin û bisekinînin. Ê dewleta Tirkiyê di encama kirîzên heyî de nikare gavan biavêje, ji lewra zextê li ser dengê civakê dike. Di heman demê de ne tenê êrişî Ragihandina Azad dike, çi ragihandinên muxalîf hene, wan jî dike hedef. Ji vê yekê tê derketin ku niha di siyaseta xwe ya li dijî ragihandinê de em ne bawer in bi ser bikeve û wê di van aliyan de bi bin bikeve”.



**Girtina rojnamevanan; Sûc e**

Her wiha Rojnamevan Sîlva Keleş da zanîn ku hedefgirtina bê sebeb li dijî rojnamevanan, sûc e û wiha got: “Girêdayî êriş û sûcên ku li ser rojnamevanan û mafê wan tên kirin, em van kiryaran şermezar dikin. Dewleta Tirk ev ne cara yekê ye ku van kiryaran dimeşîne. Bi taybet li hember meşandina xebatên Ragihadnina azad di Bakur de, dibe asteng û bi sedan rojnamevan girtine. Li gorî zagonên navnetewî û yên parastina mafê rojnamevanan, girtina rojnamevanekî bê sebeb, weke sûc tê hesibandin. Ji ber rojnamevan di hemû qadan de weke sivîl tên hesibandin û nabe ew ji aliyê dewletê ve bê girtin, mafekî wî heye ku rastiyan weke xwe raxîne holê. Armanc jî ji van serdegirtinan û kiryaran; Tunekirin û tepisandina dengê gel û heqîqeta ku tê jiyankirine.
Bi tayebt bi pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk ya ku hatiye destpêkirin re, van polîtîkeyan zêdetir dike. Ev yek niyeta wan a li hember astengkirina pêvajoyê derdixîne holê ku naxwaze pêvajoya demokratîkbûyînê û çareseriyê bê meşandin.

**‘Berxwedana wan, têkoşîn e’**

Sîlva di dawiya axaftina xwe de piştgiriya xwe ji bo rêhevalên rojnamevan raber kir û wiha bilêv kir: “Em bi yek dengî piştgiriya xwe ji bo rêhevalên me yên rojnamevan, nûçegihan û edîtorên li Bakurê Kurdistanê kar dikin û rastî zext û kiryarên dewletê tên, raber dikin. berxwedana wan li hember dewletê, bi serê xwe têkoşîn e. Rûxmî hemû astengiyan jî xebatekî bi rûmet tê meşandin”.

# ‘Serxistina pêvajoyê tenê bi axaftinan nabe divê dewlet gavan biavêje’

Hevserokê PYD'ê Xerîb Hiso diyar kir ku li ser bingeha banga dîrokî ya Rêber Apo, ji aliyê PKK'ê ve gavên dîrokî hatin avêtin û got, “Serxistina pêvajoyê tenê bi axaftinan nabe, pêwîst e rayedarên dewleta Tirk bi awayekî lezgîn gavan biavêjin.”

**Dîlan Mulhim\Qamişlo**

Li ser bingeha banga Aştî û Civaka Demokratîk, Tevgera Azadiyê gavên girîng avêtin. Herî dawî di 26’ê Cotmeha 2025’an PKK’ê vekişîna Gerîlayên Azadiyê ji Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ragihand. Gavên dîrokî yên PKK’ê li tevahiya cîhanê deng veda û bû rojev. Lê tevî wê jî heta niha dewleta Tirk tu gavên berbiçav neavêtine.
Di derbarê mijarê de Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Xerîb Hiso ji Rojnameya me re axivî.





### ‘Li ser bingeha banga Aştî û Civaka Demokratîk PKK’ê gavên dîrokî avetin’

Xerîb Hiso da zanîn ku banga Rêber Apo ya Aşîtî û Civaka Demokratîk bûye bangeke cîhanî û wiha got: “Piştî banga dîrokî ya Rêber Apo ya Aştî û Civaka Demokratîk, PKK’ê gavên dîrokî û bi erkê xwe yê serdemê rabû. Wekî dawîkirina şer, fesixkirina partiyê, şewitandina çekan û herî dawî jî vekişandina ji Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê. Ev yek nîşan dide ku ev bang bangeke cidî ye, pêvajoya ku bi riya vê bangê derkete pêş hêviya çareserî û demokrasiyeke rast e. Di heman demê de, gelek caran agirbest çêbûne û pêvajoyên çareseriyê hatin pîşkêşkirin, lê mixabin ev pêvajo ji aliyê dewleta Tirk ve hatine rawestandin. Bersivdayîna van agirbestan bi şerê mezin û siyaseta qirkirinê hatiye dayîn. Ji bo vê yekê ev pêvejoya nû li ser bingeha banga Rêber Apo ya Aşîtî û Civaka Demokratîk e, em nikarin weke berê bigirin dest. Ji ber ku gavên ku tê de tên avêtin, gavên cudatirin. Vekişandina Tevgera Azadiyê ji Tirkiyê û Bakurê Kurdistanê bi riya giştî re hate parvekirin, di heman demê de bandoreke mezin li ser raya giştî çêkir.
Pêvejoya ku Rêber Apo daye destpêkirin nêzî salekê dibe, rewşa Tirkiyê û Rêber Apo derketiye pêş. Rêber Apo bi riya banga xwe ya Aşîtî û Civaka Demokratîk rê li ber şer girt, ji ber vê yekê pêwîst e ku dewleta Tirk gavan bavêje. Lê mixabin heta niha gavên dewleta Tirk kêm in, ev kêmbûn têra pêvejoyê nake. Niha divê demê pêwîstiya dewleta Tirk bi aştî û çareseriyê heye, herwiha rewşa Tirkiyê ne weke rewşa dema berê ye. Pêwîst e dewleta Tirk xwe bide guhertin û gavên cidî bavêje.”

### ‘Pêwîst e nîqaş ji bo pêşxistina pêvejoyê werin kirin’

Hiso anî ziman ku bi pêşengiya Tevgera Azadiyê û Rêber Apo tiştên pêwîst ji bo pêvejoya Aşîtî û civaka Demokratîk hatin kirin û wiha pê de çû: “Pêwîst e nîqaşên kûr werin kirin, li ser bingehê pêşxistina vê pêvejoyê. Di gelek bajarên Tirkiyê de pêwîst e semîner ji bo aşîtî û demokrasiyê werin dayîn. Herwiha divê ku şaredariyên ku Tirkiyê û hikumeta AKP’ê ji destê DEM Partiyê girtine, vegerîne DEM Partiyê. Da ku pêvejo pêş bikeve, lewma dewleta Tirk dikara pêvejoya li Sûriyê û hevdîtinên ku di navbera Hêzên Sûriya Demokratîk QSD’ê û hikumeta veguhêz a Sûriyê tên kirin, destek bike.
Axaftin ji aliyê dewleta Tirk ve tên kirin, lê piratîk tiştek tune ye, dema ku piratîk tune be ev yek ne derbasdar e. Hinek siyasetmedar û rewşendbîrên dewleta Tirk hene vê pêvejoyê bi neyênî dirxînin. Dibêjin ku bi riya pêvajoyê wê Tirkiyê xirab û lawaz bibe, lê rayedarên Tirk weke Erdogan û Bahçelî li hemberî vê yekê bê deng in. Li hemberî vê yekê pêwîst e rayedarên Tirk xwedî helwest bin. Lê mixabin dema ku helwesta kesyatên wisa tune bibin, ev yek jî guman çêdike. Çiqasa ku axaftin werin kirin û li ser rûyê erdê were meşandin, rê li pişiya wan tên girtin. Lê rê li pêşiya pêvejoyê tê vekirin, çiqas ev kes axaftinan dikin û guman çêdikin, ev guman jî ji aliyê dewleta Tirk ve bi zimanekî nexweş tê bikaranîn. Herwiha rayedarên dewleta Tirk dixwazin ku hêviyê bişkînin, lê ev daxwaza wan çênebû.”

### ‘Pêwîst e rayedarên dewleta Tirk bi awayekî lezgîn gavan bavêjin’

Hevserokê Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD’ê Xerîb Hiso axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Dema ku pêvajo bi serkeve wê kesên xwedî zihniyeta faşîst li hember pêvejoyê lawaz bin. Di heman demê de, pêwîst e rayedarên dewleta Tirk bi awayekî lezgîn gavên cidî bavêjin, da ku pêvajo were parastin û bi ser bikeve. Lê serxistana vê pêvajoyê tenê bi axaftin nabe, bi pratîk dibe. Ji ber vê yekê em bi hêvî ne ku rayedarên Tirk axaftinên ku dikin di pratîk de têk bînin. Heta niha ev pêvajo bê destwerdana cîhanî pêş dikeve. Her kes pêvejoyê û gavên ji aliyê Tevgera Azadiyê rast dibînin û ji aliyê wan ve hate pîroz kirin.”

# Çarenûsa Kurdan a di Qada Şer a Guherbar de: Aştî yan Lîstikeke Nû?

**Erdogan Altan**

Piştî salên dûr û dirêj ên şer û pevçûnan, nûçeya vekişîna ji çiyayan, bêguman berî her tiştî ji bo gelên me yên ku hesreta aştiyê dikşînin, bû tîrêjeke hêviyê. Hêviya sekinandina xwîna ku dirije, vebûna kanalên siyasetê û derfetek ji bo çareseriya demokratîk a pirsgirêka Kurd, hesta herî bingehîn bû ku ev pêngav bi wate dikir. Lê belê, dema mirov li pêngavên dewleta Tirk û hêzên herêmî yên li pişt deriyên girtî dinêre, pêwîst e ku bi baldarî were pirsîn ka ev “pêvajoya aştiyê” ji bo Kurdan tê çi wateyê.
Dewleta Tirk vê vekişînê wekî “serkeftineke” operasyonên xwe yên leşkerî pêşkêş dike û pêvajoyê wekî rêya ber bi “tesfiyeya” rêxistinê ve bi nav dike. Yanî, niyeta wan ne çareserkirina pirsgirêkê ye, lê barkirina navenda pirsgirêkê ji nav sînorên Tirkiyeyê ber bi Başûrê Kurdistanê ve ye. Ev ne bidawîkirina şer e; tenê guhertina qada şer e. Ev stratejî, armanca xwe ya afirandina zextê li ser hikûmeta Iraqê, neçarkirina Bexdayê ku li dijî Kurdan helwest bigire û zêdekirina nifûza Tirk a li herêmê vedişêre.
Di vê nuqteyê de, çarenûsa Kurdan careke din li ser textê setrencê yê hêzên mezin dibe piyon. Raporên ewlehiyê yên Amerîkayê bi eşkereyî îtîraf dikin ku hebûna PKK’ê ya li Başûrê Kurdistanê wekî “karta bazarê” di navbera Enqere û Bexdayê de tê bikaranîn. Îran, ji aliyekî ve xuya dike ku piştgiriyê dide vekişînê, lê ji aliyê din ve ji bo kûrkirina nakokiyên di navbera Kurdan de lîstika xwe dilîze. Rêveberiya Herêma Kurdistanê (PDK û YNK) di navbera zextên aborî yên Tirkiyeyê û daxwazên gelê xwe de asê maye. Her kes berjewendiyên xwe diparêze, lê ya ku zirarê dibîne dîsa yekîtî û paşeroja gelê Kurd e.
Detayeke girîng a ku ji çavkaniyên Rûs derketî, xala kilît a vê hevkêşeyê kurt dike: “Tirkiyeyê bi neberdana Rêber Abdullah Ocalan şaşîtiyeke mezin kir û ev yek dê bandorê li diyalogê bike.” Ev tesbît, cewhera mijarê radixe ber çavan. Aştiyeke rasteqîn û çareseriyeke demokratîk, ancax û ancax bi diyalogeke bi wate ya ku îradeya gelê Kurd temsîl dike, ango bi tevlêbûna Rêber Abdullah Ocalan pêkan e.
Wekî din, her pêngavek ku were avêtin, dê ji pêngaveke taktîkî ya ku şer ji erdnîgariyekê dibe ya din, Kurdan di hevkêşeyên herêmî de dike amûra bazarê û di dawiyê de bêçareseriyê kûr dike, wêdetir neçe.
Jiyanî ye ku gelê me vê pêvajoya nû, bi parastina hêviya aştiyê lê di heman demê de bi hişyarbûna li hemberî lîstikên hêzên mezin û dewletên mêtinger bixwîne. Têkoşîna esil, bêyî ku girêdayî erdnîgariya şer be, xurtkirina zemîna siyaseta demokratîk û yekbûna ji bo mafên rewa yên gelê Kurd e.



# ‘Rakirina bendên kontrolê aktîvkirina bendên hevbeş e’

Hevserokê Meclisa Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo diyar kir ku ji bo rakirina astengiyên li pêşiya pêkanîna bendên peymana 1`ê Nîsanê, herwiha rakirina ambargoya li ser her du taxan, wan bendên kontrolê rakirin û got, “Şertê bingehîn ê rakirina bendên kontrolê yên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, aktîvkirina bendên hevbeş e, da ku rola xwe bi awayekî guncavtir pêk bînin."

**Birûc Resûl//Heleb**

Di demêkê de ku gelên Sûriyê li hêviya lihevkirina aliyên Sûrî ye, hikumeta demkî bêyî ku girîngiyê bide peymanên ku îmaze kirine, bi taybetî peymana 1’ê Nîsanê ya li gel Meclisa Sivîl a Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, hewl dide demê qezenc bike û temenê pêvajoya demkî dirêj bike. Hikumeta veguhêz ti gav ji bo bi dawîkirina aloziyan neavêt, heya roja îro her dû tax di dorpêçeke giran de ne û rê nadin ku sotemanî derbasî wan taxan bibin, tevî ku demsala zivistanê hatiye û pêwîstiya gel bi mazotê heye. Herwiha Hêzên Ewlekariya Hundirîn yên Helebê di çarçoveya bicihanîna peymana 1’ê Nîsanê ya bi hikumeta veguhêz re, roja înê (14 Mijdar 2025) bendên kontrolê yên ketina taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê rakirin. Da ku hincetên hikumeta veguhêz nemîne û ew jî gavan bavêje û bendên peymana 1`ê Nîsanê pêk bîne.
Di derbarê rewşa dawî ya taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Hevserokê taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo ji Rojnameya me re axivî

### ‘Taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji hemû aliyan ve hatine dorpêçkirin’

Nûrî Şêxo di destpêka axaftina xwe de wiha anî ziman: “Heya niha peymana Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bi awayekî durist û



ewle ne hatiya pêk anîn, yê ku berbisiyartiya vê yekê radike hikumeta veguhêz a Sûriyê ye. Ji ber ku dema rêjîma Baas helweşiya, hêviyên gel zindî bûn ku êdî ew ê di nava jiyaneke aram bijîn. Lê me dît ku hikumeta veguhêz ji rêjîma Baas ne dûr e, ew hêviyên gel hatin şikandin û gel ket nava berxwedan û tekoşînê de. Bêguman gelê kurd her di nava berxwedaniyê de ye li kêleka wê jî rêya tekoşînê bernadin. Bi hatina hikumeta veguhêz a Sûriyê re, taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ket di nava zext û dorpêçeke giran de. Taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ji hemû aliyan ve hat dorpêçkirin, êdî gelê taxê nema karîbûn nesef bistînin, li hemberî van kiryaran û sûcên dijmirovê, gel rabû serhildanan, ev nêzîkatiyên hikumeta veguhêz a Sûriyê qebûl nekirin û bertek nîşan dan. Li vir êriş çêbûn, heya ku me şehîd û birîndar jî dan, lê belê ev ji bo me serfirazî bû ku gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê bindestî û jiyana tarî qenûl nekirin.”

### ‘Em rê nadin tu kesî ku jiyana gelê me bike bin metirsiyê de’

Nûrî bal kişand ku pêwîst e hevdîtin û geftogo di navbera me û hikumeta veguhêz a Sûriyêp ne rawiste û wiha dewam kir: “Em her dem ji xwe di pirsin gelo çima peymana 1`ê Nîsanê pêk nehat, ev di encama ku hevdîtin kêm dibûn û qutkirinek dihat çêkirin, ji ber vê yekê me hewil da ku bi rêya hevdîtinan û nîqaşê pirsgirêkên heyî werin çareserkirin, em şer û pevçûnan naxwazin. Tenê armanca me ew ku gelê me bi awayekî aram û rehet bijîn, di heman demê de ku tu kes jiyana wan neke bin metirsiyê de. Ji ber vê yekîê pêwîst e hikûmeta veguhêz a Sûriyê erkên xwe yê exlaqî û insanî pêk bîne, pêwîste bendên di 1`ê Nîsanê de hatiye îmzekirin, pêk were. Her wiha ev hedîtin û nîqaş heya roja îro berdewamin, em ê hewledanên xwe heya dawî bidin tenê ji bo pêkanîna pêvajoya Aştî û Civaka Demokratîk.”
Guhertinên ku tê çêkirin
Nûrî Şêxo di berdewamiya axaftina xwe de diyar kir ku piştî nîqaş û peymana 1`ê Nîsanê hin guhertin hatin çêkirin û wiha pê de çû: “Ji bo pirsgirêkên heyî yên di taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê de çareser bibin, me hevdîstin zêdekirin, da ku em bighîjin encamekî. Me li peymana 1`ê Nîsanê vegeriyan û ji nû ve me li ser nîqaş kir ku em çawa karibin wan xalaln bikin piratîkê de, niha di taxa Şêxmeqsûd û eşrefiyê de hin guhertin çêbûne, ev guhertin ew e ku em çawa karîbin bi hevre taxan bi rêve bibin û ewlehiya wê bi parêzin. Di çarçoveya avakirina baweriyê û rakirina hemû hincet û astengiyên li pêşiya pêkanîna bendên peymana 1`ê Nîsanê û rakirina ambargoya li ser her du taxan de ne, şertê bingehîn ê rakirina bendên kontrolê yên Hêzên Ewlekariya Hundirîn, aktîfkirina bendên hevbeş e da ku rola xwe bi awayekî guncawtir pêk bînin, bi taybetî piştî ku endamên pispor di aliyê hejmar û kalîteyê de anîn.”

### ‘Dorpêçkirin tê wateya dorpêçkirina mirovî û kiriyarên ne wijdanî’

Nûrî da zanên ku pêwîst e bi awayekê acil rêya Dêr Hafir were vekirin û wiha got: “Heya roja îro jî dorpêç li ser Şêxmeqsûd û Eşrefiyê heya, bêguman ev dorpêç pirsgirêkên aborî, çûn û hatinê li ser jiyana gel bi awayekî neyinî bandor dike. Niha demsala zivistanê hatiye û heya roja îro sotemanî li ser gelê Şêxmeqsûd û Eşrefiyê ne hatiye belav kirin, ji ber vê, yek ji nîqaşên me ew e ku bi awayekî acil dorpêç li ser her dû taxan were rakirin û bi taybetî jî rêya Dêr Hafir. Dorpêçkirin tê wateya dorpêçkirina mirovî û kiriyarên ne wijdanî.”

### ‘Em li peymana 1’ê Nîsanê bi dîtineke taktîkî nanêrin’

Hevserokê taxa Şêxmeqsûd û Eşrefiyê Nûrî Şêxo di dawiya axaftina xwe de wiha anî ziman: “Em peymana 1’ê Nîsanê bi dîtineke taktîkî nanêrin, lê belê em bi nêrîneke stratejîk a demdirêj lê dinêrin. Me erkên xwe bi cih anîne û em niha li benda hikumeta veguhêz in ku erkên xwe bi cih bîne, ew pabendî diyalog û peymanan in heta bi temamî li ser astên perwerde, xizmetguzarî, ewlehî û hwd werin bicihanîn. Me erkên xwe bi cih anîn û ti hincetên hikumeta veguhêz nemaye, êdî em ê beda gavên wan bin, ji bo jiyaneke demkratîk, aştî û aram.”



## Qonaxa yekem; Aştî



**Farûk Sakik**

Hefta borî, min mînaka pêvajoya aştiya, li Kolombiya û FARC’ê dabû û di vê nivîsê de em ê derbasî Endenozya û Acehê bibin.
Aceh, li rojavayê Endonezyayê ye.
Di dîrokê de herêmeke nîv-xweser bûye û têkiliyên wê yên kûr bi çanda Îslamî û nasnameya herêmî re hebûn.
Di nîvê duyemîn ê sedsala 20’an de, polîtîkayên navendî yên dewleta Endonezyayê û bikaranîna çavkaniyên xwezayî (bi taybetî petrol û gazê) nerazîbûna gelê Acehnî zêde kir.
Tevgera Serxwebûna Acehê (GAM) ku di sala 1976’an de hate damezrandin, li dijî hikûmeta Endonezyayê têkoşîneke çekdarî da destpêkirin. Di destpêkê de tevgereke berxwedanê ya biçûk bû, GAM hêdî hêdî piştgiriya beşek girîng a gelên heremê bi dest xist.
Lê belê, operasyonên leşkerî yên dijwar ên artêşa Endonezyayê, binpêkirinên mafên mirovan û komkujiyên li dijî sivîlan şer kûrtir kir. Ev yek bala hêzên navneteweyî kişand ser xwe.
Li Kurdistan jî piştî şerê çekdarî, em heman tiştî dibînin. Dewleta Tirkiyê bi awayek hovane bi ser sivîlan de çû.
Erdhej û Tsûnamiya wêranker a ku di sala 2004’an de li Acehê çêbû û bi hezaran kes jiyana xwe ji dest dane.
Ev kareset bû bingeha aştiyê ya di navbera Endonezya û GAM’ê de.
Li Kurdistande jî Tsûnamiya siyasî dema ku li Rojhilata Navîn pêkhat, di navbera PKK’ê û dewleta Tirkiyê de zemîna aştiyê dest pê kir.
Li Endenozyayê, danûstandinên ku di sala 2005’an de bi navbeynkariya Norwêcê dest pê kirin, di dawiyê de veguherîn peymana aştiyê ya bi navê ‘Peymana Helsînkî’. Ev peyman van xalan destnîşan kir:
-GAM wê çekên xwe deyne.
-Aceh wê xweseriyeke berfireh bigire.
-Artêşa Endonezyayê dê bi piranî ji herêmê vekişe.
-Mekanîzmayên tezmînat û lihevhatina civakî wê ji bo qurbaniyan werin avakirin.
Li Kurdistan navê Peymana Helsenkî, pêvajoya ‘Aştî û Civaka Demokratîk’ bû. Hîna jî ev pêvajo negihîştiye encamekê an jî peymanekê.
Bi heman awayî li Tirkiyeyê, daxwazên Kurdan ji bo rêveberiyên xweser û naskirina mafên çandî ji bo çareserkirina pevçûnê girîng in.
Lê belê, navbeynkariya navneteweyî û beşdariya berfireh a herêmî di modela Acehê de ji ezmûna Tirkiyeyê cuda ye.
Rêber Apo jî di pêlên çareseriyê de her tim dixwest ku navbeynkariya navneteweyî hebe. Lê kompleksên Tirkiyê yên siyasî her tim bûn asteng û dest nedan vê yekê.
PKK hemû berpirsyariyên xwe yek bi yek anî cîh. Herî dawî hêzên Gerîla ji Zapê vekişand da ku pêşî li provaksiyonên şerxwazan bigire.
Dîsa ji bo beşdariya berfireh a herêmî Rêber Apo di nav hewldanan de ye. Bi tenê li meclisê avakirina komisyonê bersiv dane daxwazên wî.
Ev giran tevgerîna dewletê, bê bersiv hiştinê, zimanê zincarî, dibe sedem ku di nav civakê de ev pêvajo ya Aştî û Civaka Demokratîk baş neyê fahm kirin. Hin deng bilind dibin, heger Kurdistan azad nebe çima li Tirkiyê komarek demokratîk were avakirin.
Bi rastî bersiva vê yekê hatî dayîn. Ev kesên vê pirsê dikin, dibin bandora siyaseta Tirkiyê de dimînin. Li Tirkiyê siyasetek gemarî ku dibêje, PKK qediya, doza Kurd, pirsgirêka Kurd nîne, armanca me qedandina PKK’ê ye. Dema Gerîla ji Zapê vekişiya mihabirê CNN Turk yeka kontra digot, eskerê me ew ji wêderê derxistin.
Ev taluke di nav civakê de belav dibe.
Em wek li Endenozya di çavderiya hêzên navnetewî de vê pêvajoyê bi rê ve nabin. Karê me zor û zehmet e. Anha em di merheleya pêkanîna aştiyê de ne. Hîna derbasî qonaxa civaka demokratîk nebûne.
Ji bo vê yekê azadiya Rêber Apo tê xwestin. Ew dîrek divê bi civakê re di kontakêde be. Civak divê dîmenên wî bibîne û dengê wî guhdar bike.